


# NEWROZ

*Dr.Nûredîn Zaza*
*1919 - 1988*

*Xebat ji bo* :
* **Zordarî ji ser gelê me yê Kurd li Sûriyê rabe.**
* **Azadiya demokrat û rêzgirtina mafên mirovan.**
* **Mafên gelê Kurd ên netewî di çarçewa yekîtiya welêt de.**

*Osman Sebrî*
*1905 - 1993*

*Ji weşanên* Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê

*Hejmar ( 124)* | *Sal 21* | *Cotmeh 2016 z - 2628 k* | *Buha (75)L.S*




# Cotmeh.. Meha Şehîdan...


**Desteya sernivîser**


Ji despêka meha Cotmehê de, şerekî giran di navbera Hêzên Sûrya Demokratîk(HSD) û artêşa dewleta Tirk û hin çeteyên rikberiya Sûryê ya navgir (معتدل) de li Rojhilata Herêma Efrînê û Bakurê Helebê dibe. Dewleta Tirk balefirên xwe yên cengê û hemî cureyên çekên giran li dijî şervanê HSD û navça Efrînê bi kar tîne. Di encama ev şerê giran de, bi dehan ji şervanên HSDê û bi sedan sivîlên bêguneh bûne qurban û ketin nava rêzên pakrewanan; û bi deh hezaran ji Kurd û Erebên deverê jî aware û mişext bûn.



Derbasbûna artêşa Tirk li nava xaka Sûryê, desdirêjî û destêwerdaneke qirêj û ne rewa ye, û li tersî hemî zagonên navdewletî ye. Lêbelê zor mixabin!, eger pirs tê ser gelê kurd û têkoşîna wî, dewleta Tirk û Sûrye, Îran jî, her tiştekî rewa dibînin û rêkê li pêş Kurdan digirin.

Şerê ku artêşa Tirk û çeteyên rikberiyê yên (navgir) li derdora Efrînê û Bakurê parêzgeha Helebê pêxistine, du armancên wê yên sereke hene, yek jê, rê li ber HSD bigirin da ku negihên navça Minbicê û rê di ……..… 2

## Yadeya Şeşan a Goçkirina Hevalê Nemir Smaîl Umer

Li roja 26a meha cotmehê, bîranîna şeşan a goçkirina serokê partiya me PYDKS hevalê nemir Smaîl Umer derbas bû. Bi wê boneyê, rêxistinên partiyê li welêt û li derva, gelek ahengên bîranînê li dar xistin. Hejmareke mezin ji dost û hevalên partiyê û nemir Smaîl tê de beşdar bûn. Di wan ahengan de, li derbara kesayetî, raman û nêrînên wî yên netewî û siyasî yên cudawaz, û sincî, kar û xebata wî ya payebilind hate axaftin, û mixabinî li ser goçkirina ... 5

## Rewşa Çandiniyê Li Efrînê


**M. Elî**


Navça Efrînê bi çandiniya xwe ya rengereng navdar e, û jiyana xelkê wê –bi şêweyekî tevahî- li ser berhemên çandiniyê radibe, nemaze jî darên zêtûnê.

Çandiniya navçê jî li ser pênc stûnên sereke rabûye, xaka şov خصب nemaze li Deşta Cûmê, peydabûna avê, bidestxistina ………9

## Penaberî ... Heyama Civakî li Almanya.


**Dr. M. Zeyno.**


Li gor lêkolîneke dezgeha fêdralî ya tewanan /BKA a Almanya 800 car kampên penaberan rastî hêrişên tund hatin e. Ev bûyer bala mirovan dikşîne ser rewş û tevgera hundirî ya civaka Almanya, ew tevger îro …… 2

**Penaberî … Dûmahîk**

bêhtir ber bi tundî û dijîtiyê ve diçe. Komên radîkal ên "rastgir" roj bi roj zêde dibin û pêleya radîkalan bilind dibe. Heger mirov bala xwe bide çalakiyên wan li kolanên bajaran, mirov dibîne ku kesên bi wan re derdikevin meş û mîtingan xurt in, ango nifşê nûgiha ye, ewên ku sibe paşeroja vî welatî dikeve ser milê wan, sibe ewê bibin wezîr û mudîr û karmend û desthilat. Ev diyardeyeke pir buve û nîşana tundiyê ye. Helbet ji ber sertiya yasa û qanûnan ew hîn ne gihane asta hêrişên fereh û cemawerî, lê dema em dibînin ku pêleya sertî û tundiyê salane bilind dibe, wê gavê pêwîst e ev bûyer bête şirovekirin.

Li gor heman dezgehê, sala 2013an tenê, 69 bûyeran rû da bûn. Di sala 2014an de ast bilind bûye û gihaye 199 bûyerên şewat, kavilkirin û lêdana fîzîkî li dijî penaberan. Her demekê em di mediya almanî de dixwînin ku di encama hêrişan de penaberek birîndar bûye, an kampek penaberan rastî agir û



şewatê hatiye; an komek ji radîkalan siloganên tund li dijî biyaniyan dibêjin mîna ``Biyanî (pîsî) ne, Biyanî derkevin derve...``. Ev diyarde û bûyer bêhtir li eyaletên Rojhilata Almanya rûdidin. Ew eyalet yên Almanya Demoqrata berê ne. Li wir asta dijitiya penaberan gelek bilind e. Li bajar û bajarokên wan eyaletan zêde çalakiyên li dijî penaberan birêve diçin, hêjî heyama civakê sebaret biyaniyan li wê deverê nerm û aram ne bûye.

Li gor hin çavkaniyan, gelê Alman li wan eyaletan li berамberî eyaletên Rojavaya Almanya, di rewşeke aborî e ne baş de dijî. Hejarî û pileya bêkaran li vir bilind e. Li hember vê rewşa xirab û ne baş, pêwîst e penaber çi bike?. Li gor me, berî her tiştî, gerek e penaber guh bide van tiştan...

1- Bi zûtirîn dem xwe fêrî zimanê almanî bike.

2- Bi zûtirîn dem belgenameyeke kar bi dest xîne "Ausbildung".

3- Cihekî kar ji xwe re bibîne.

4- Bi lez ji ser lîsta navenda kar " Job Center " derkeve û jiyana xwe bi cefa û karê xwe rêve bibe.

5- Tu carî ne fikire bertîlan bide karmendan.

6- Tu carî yasa binpê neke..

7- Tu carî ne fikir ku her tişt ji bo te hêsan e.

8- Zani be ku tu penaber î, û her gavek te bala civakê dikşîne. Helbet ev merc ji bo mirovekî nû hatî Almanya ne hesan in, ji ber ku her yekî ji wan bi dehan arîşe û xem û qisawet hene.

---

**Cotmeh … Dûmahîk**

navbera herêmên kurdî de venebin, û Efrîn dorpêçkirî bimîne; ya din jî, malaneke(pakirin) nijadî li gundên Kurdên Bakurê Helebê çêkin û wan aware û penaber bikin. Bumbekirina gundên Kurdan çi li Efrînê û çi li Bab, Ezaz û Minbicê di çarçewa pêkanîna ew ermanca qirêj de tê kirin, ew jî ne tenê armanca dewleta tirkiyê, hêzên rikber ên tundrew tê, ew li heza sazûmana Sûryê jî tê.

Lê mixabin!, tiştê seyr û balkêş ew e, ku hemî aliyên keftleftê, çi dewletên destêwerdar mîna Rûsya û Emerîka, û çi sazûmana Sûrî û rikberiya wê, li derbara hêriş û hovîtiya dewleta Tirk li ser navçeyên kurdî û Bakurê Sûryê xwe ker kirine û dengê xwe nakin, wekî ku ew di bin re bi wê re û jê re erê dikin. Ev jî pêwîst û pêdivî dike, ku rêvebirên HSD û Xweseriya Demkratîk jî du caran biramin û paşê gavên xwe bavêjin; çinkî parastina gel û war di pêş hemî nexşe, pêwendî û helwestên siyasî de ye.

Nemirî ji pakrewanan re, çakî ji birîndaran re, û serketin ji azadî û aştiyê re.

# Alîtî û Destêwerdan



Mislim Şêx Hesen

Bêguman Şoreşa Sûriyê ya ku berî pênc salan ji parizgeha Der`a de dest pêkir, di bin bandora wê de, pir guhartinên bingehîn û girîng li ser nexşeya Sûriyê rûdan û her wiha gelê kurd û tevgera xwe ya siyasî jî li benda derfet û guhartinên weha bûn, ku xwe ji kiryarên kirêt yên rêjîma Be`is ku bi deh salan dermafên gelê kurd bi kar tanîn rizgar bike û mafên xwe yên dadmend û rewa wergire. Lê mixabin gava ew derfet peyda bû, xuya kir ku tevgera siyasî ya kurd li sûriyê ku nêzî şêst salî têkoşîn û xebatê dike, ne li gor qunax û astê bû, û pêşbîn û guman hene ku wan derfetên zêrîn yên ku gelê kurd bi sed salan li bendê bû ji dest xwe berdide û sûd ji wan derfetên ku li vê dawiyê peyda bûne wernagire, û armanc, û maf, û gelê kurd jî wê bindest bimînin. Belkî sedema sereke jî ew e, ku xwe kirine alî (Mehawir) ji hêzin kurdistanî re, biryarên xwe ji wan aliyan werdigirin û her wiha aliyên kurdistanî jî doza kurdî li Sûriyê kirine xizmeta berjewendiyên xwe. Lewra jî bandorek zor neyînî li doza kurdî ya Sûriyê dike, û eger rewş wiha dom bike, wê pêşeroja gelê kurd li Sûriyê pir kambax be.

Vêca mirov kare bêje, ku ew derfet niha ji dest Kurdan çûye, û Kurdan wek hemû carên borî, sûd ji derfetan wernegirtine, û ev bi xwe jî diyar dike, ku tevgera siyasî ya Kurd li Sûriyê neserkeftiye di siyasetê de û tête xapandin, û encamên vê siyaseta şaş jî baş xuya dike, ku çiqas ziyanek mezin bi gelê Kurd û piroja wî ya siyasî dike, û dibin sedema winda bûna gelek derfetên ku ji gelê Kurd re çêbûne.

Vêca divê her du alî, ENKS û TEV-DEM di zotirîn dem de li xwe venegerin û xwe ji wan çeper û alîtiyê (Mehawir) bibirin û biryarên xwe li ser qada Kurdistan Sûriyê wergirin û li gor berjewendiyên Kurdên Sûriyê bixebitin, da ku derfetên girîng ku peyda bûne ji destên gelê Kurd neçin û sûdê ji wan wergrin.

Ji ber vê yekê jî, lihevkirina tevgera siyasî ya Kurdên Sûriyê divê rewşa hestyar de pêwîst û girîng e, her wiha yek rêziya siyasî û helwesta Kurd jî dibe di zûtirîn dem de were avakirin, ji bo ku armancên gelê Kurd bi dest bikevin û dîsa derfet .... ⓫

# Pirs û Daxweza Gel

Merwan Berekat

Roj bi roj lêdanên navkelên vî welatî pirtir têne keyandin, ji aliyekî ve şer, dorpêçkirin, xwînrijandin, sertiya jiyanê û oxirkirina karwanên pakrewanan. Ji aliyekî din ve jî nelihevkirin, ezîtiya partîtiyê, piralî, diltengî û xewnerojkên çêkirî tev tevleheviyekê bi welatiyan re peyda dikin.

Birastî, dema ku mirov çavên xwe li tabloya rewşa Sûrî bi şêwakî giştî, û ya Kurdan nexasim digerîne, bêtir rengên tarî û siberojeke ne diyar dibîne. Di vê qunaxê de piraniya xelkê di heyama nakokî, ne aramiya jiyanê û kelecana tires de dijîn.

Bi vê rastiyê re, gelek pirs xwe davêjin ser maseya rêvebir, partî û siyasetmedarên Kurd; milet dipirse, û hin ji wan pirsan mîna: Di van çend salên borî, nemaze 2016an de hate naskirin ku piraniya kesên soz didan Kurdan û digotin: Em piştgirê doza we ne, û Kurdan jî ew dost ji xwe re didîn, wan cilên xwe yên derwîn ji xwe kirin û nijadperestya xwe eşkere diyar kirin. Ma gelo çima hin ji aliyên kurdî yên siyasî li kêlek wan, an di siya wan de tevdigerin?! Hemû dewletên herêmê û li ser serê wan Îran, Îraq, rêjîma Sûriyê û dewleta Tirkiyê dema hestwar bûn, ku Kurdên Rojavayê Kurdistanê ji armanca xwe ve nêzîk dibin, wan hemû nakokiyên xwe yên kevin û nû, yên biçûk û mezin danîne aliyekî û li pêş armancên gelê Kurd gihan ….. ❿

Nêrîna Azad

# Em tev sûcdar û berpirsiyar in

Memê Alan

Di baweriya me de, tevgera netewî ya kurdî parve ser gelek şax û baskan dibe, tevgera siyasî, tevgera rewşenbîrî, tevgera aborî, tevgera ragihandinî,…û H.W.D . Tevgera me bi giştî ji zikê civaka me derketiye, yanê endamên wê ez û tu û ew in. Civaka me ya kurdî jî civakeke li şûn e , ji ber ku herdem bindestê rijîmine li şûn bû û tucarî dewletbûn jî nedîtiye. Ji ber wê jî tiştekî normal e, ku mirovê Kurd salix û xuyên li şûn û ne baş (mîna ezîtî û jixwehezkirina kesayetî, malbatî, eşîrtî , partîtî, … û hwd) wergirtibe, û bandora wê bi awakî neyênî li tevaya xebata me ya kurdî ya bi hev re bike.

Bandora neyînî ya wan salix û xûyên ne baş ku bi me girtine, di tunebûna karên hevbeş û saziyane di xebatên me yên siyasî, rewşenbîrî, aborî …û hwd de xuya dibe. Yanê weke çawa partiyên me yên kurdî di bin bandora ezîtiyên xwe yên kesîtî û partîtiyê ne, li hev nakin û yekrêziya xwe pêk nînin, rewşenbîrên me jî di kulên xwe yên kesayetî de fetisîne, û tenê li berzkirina xwe ya wendayî digerin, nikanin bi awakî saziyane bi hev re xebata xwe bikin û bandoreke erênî di pêşxistina civata xwe de bikin, her weha aborkarên me jî nikanin kompaniyên hevpar bi hev re çêkin, aboriya kurdî bi pêş xînin û têkin xizmet tevgera wî yê giştî. Di vî warî de, em dixwazin bi bîr wînin, ku piraniya rewşenbîrên me ji malçûka tevgera siyasî derketine.

Lê mixabin, ji ber gelek sedemên nas û ne nas, belkî hin ji wan sedeman jî kesayetî û ezîtî bin, rewşenbîr, aborkar û rojnamevanên me jî di ber rewşa



ku Gelê Kurd tê re derbas dibe de, xwe sûcdar û berpirsiyar nabînin, û tenê berê tîrkevanên xwe berve tevgera xwe ya siyasî kirine û ji rexnedayîna xeynî xwe re hazir û amade ne. Di baweriya me de, ev bi xwe nexwaşiyeke din e gelên şûndemayî ye, em Kurd jî yek jê ne. Û ji ber ku, em tev di ber vê rewşa heye de berpirsiyar û sûcdar in, gerek e em bi hev re dest bi dest û mil bi mil vî barî hilgirin û guherînek erênî di hiş û ramana xwe de çêkin, berve karê hevbeş û saziyane herin, da ku em gelê xwe ji vê zêrzemînê derînin û derfetên pêşxistin û serkeftina xwe pirtir bikin.

---

Xelek 2

# Ji dîroka kurdî ... Kesayetî û helwest

## Şahê Med ê Şoreşger Xeşterît, Bav û Kurik

Dr. Ehmed Xelîl

Werger: Heyder Omer

Damezrênerê şahnişîna Med; Deyako sala (674/675b.z) mir, û kurê wî Xeşterît/ Khahathria, ku li ba Girîkan bi Feraort/ Phraortes tê naskirin, şûna wî girt. Deyakonov weha diçe û dibêje, ku dema bavê wî bo welatê Aşûr hatibû sirgunkirin, ew li wî welatî hate perwerde dikirin, û hate amadekirin, ku bibe hikumdarekî mêldarê wan, û tedbîr û polîtîka wan bixebitîne, Aşûriyan lawên pêşewayên gelên din jî wisa perwerde dikirinn. Dewleta Osmanî heman polîtîk li gelên lawên mîr û axa û begên Kurd bi kar dihanîn . Dema, ku nakokiyên ji bo desthilata şahnişîna Aşûr serî hildan, şah Senharîb/ Sennacherib (704 – 680 b.z) bi destê lawekî xwe hat kuştin, û kurê wî yê duyem Esîrheddon/ Eserhadoon (680 –669 b.z) şûna bavê xwe girt. Evan nakokiyên ji bo desthilatê di navbera rêvebirên Aşûr de, Xeşterit ber bi vejîna pirojeya rizgarkirina welatê Med ve têvedan, cefayên bavê wî Deyako jî ber bat nebû bûn.

Gewretirîn destkeftiyên Deyako ew bû, ku wî hemî êlên Medan dabûn ser hev, û …… ⓫



**Yadeya Şeşan … Dûmahîk**

wî ya berîwext hatin nîşandan.

Li bajarê Efrînê jî, li navenda partiyê, ahengek bi wê boneyê li dar ket, û li gel gelek dost û hevalên partiyê, berêz Mihidîn Şêx Allî sekretêrê partiya Yekîtî jî lê amade bû.

Piştî rêwresmên destêkirina ahengê, berêz Şêx Allî gotineke fere û nirxdar li ser rewşên ku doz û navçeyên kurdî li Sûryê tê re derbas dibin, û rewşa Sûryê û Rojhilata Navîn bi giştî tê de ye, kir.

Li derbara têror û têrosîtan, berêz Şêx Allî teqez kir, ku ew li ser tevaya gelê Sûryê xetera mezin e, Rojhilata Navîn, cîhanê û gelê Kurd jî; û xebata gelê Kurd û şerê tevaya hêzên kurdî, Yekîneyên Parastina Gel û pêşmergeyan li dijî têrorê û ji bo parastina axa Kurdistanê, bilind nirxand.

Berêz M.Allê têkliya berçav û aşkere di navbera dewleta Tirkiyê û hêz û rêxistinên terîst de şermezar kir, û got ku Tirkiyê pizdanka dankirina têrorê ye li seranserî herêmê, û neyartiya xwe ji gelê Kurd re bi destê wan têrorîstan pêk tîne, û ji bo wê yekê, ew li gel artêşa xwe, yekser derbas nava sînorên dewleta Sûryê bûye û şerê doz û mafên gelê Kurd dike; loma jî, ji maf û erkên gelê Kurd e, ku li her derekê xwe biparêze; lewre jî, şerê ku lehengên Kurd çi li Bakurê Helebê û li Reqayê têkoşîneke rewa û durust e, û ciyê pişgiriyê ye.

Mamoste M.Allî got jî, ku qeyrana Sûryê her diçe kûr û pirşaxî dibe, pir dest û aliyên ji hemî reng, berjewendî û dewlet destên xwe dirêje nav dikin, loma jî gumana pir ew e, ku qeyran hîn berdewam û demdirêj bibe, û madam piştgirên mîna Tirkiyê û dewletên kendavê piştgiriya têroran dikin, ra eger Daiş û hêzên têrorist ên mîna wê ji ser zemînê winda bibin jî, ewê di bin ariyê de bimînin û kîjan roja be wê dîsa geş bibin.

Li derbara helwesta partiya Yekîtî, rêzdar M.Allî li ser şêweya xebata sivîl û aştiyane ya partiyê tekez kir, û got em ji berê û paşê de bi xebata sivîlane û aştiyane re ne, û emê herdem li dijî çareserkirina qeyranên siyasî bi şêweyên çekdarî rawestin, çinkî kuştin, wêrankirin welatan ava nakin, û paşerojê jî wêran dikin; ew jî ji berê de helwest, nêrîn û baweriya me bû, û em hîn jî li ser wê baweriyê ne.

Li ser gotinên ku li derbarê helwesta partiya Yekîtî ji partî û hêzên kurdistanî ve, Mamoste Allî tekeze kir, û got ku em tucarî xwe bi aliyekî ve girênadin, rêz û spasiya me ji xebata hemî partî û aliyên kurdistanî re heye, lê em xwe naxin nava siyaseta xendekan, ji ber ku em baş dibînin û zanin ku ziyana wan ton siyasetan ji sûda wan bêtire.

Li derbara helwesta partiyê ji Rêvebirya Xweser jî, M.Allî tekeze kir, û got, digel hemî kêmanî û karên ne durust ên karmendên wê, ku rexneyên me jê re hene, lê em xwe şaş nakin û nakokiyên biçûk danînin pêş nakokiya mezin, û em di wê yekê de pir haydar in, loma jî digel hemî tiştî em parastina Rêvebiriya Xweser wek erk û stubarî dibînin.

## Sonda Sîng

**Mamed Cimo(Firensa)/**
Facebook

Dema ku mêrkî Kurd kuta li sîngê xwe dixe, yek kutan li orta sîng jî dixe, ne li ser kêlekeka sîng. "Sîng" di koka xwe de "sîn: asîman, Gola Hişîn, Xwedawendê Pîroz" e. Kutîna sîngan wata sondê dide: Sond bi Xwedawend dibe.

Îşte, xortê Kurd kutan li sîngê xwe dixe, ku wê tola Kurd û Kurdistanê li erdê nehêle.

# Pevçûnên Zarokan



Hekîm Ehmed

Ji destpêka ku mirov xwe li ser erdê dîtiye, ew tim xwe beşek ji koma derdora xwe dibîne, yek ji xeysetên mirovan yên taybet ev civakhezî ye. Kî dikare bi tena xwe bijî? Tim bersiva vê pirsê ku kesek tine ye karibe hemû rewş û pêdiviyên jiyana xwe bi tena xwe peyda bike, ji ber ew pêdivî ne tenê şênber in, ne xwarin, vexwarin, çek û pêlav û derman tenê ne, pêdiviyên mirovan ji wilo bêhtir in, ew hewceyî heskirin, ewlehî, naskirin û têkildarî ne jî.

Heya bi çîrokên xeyalî yên ku lehengên wan kesekî dûrî civaka mirovî ye (Mawklî,Tarazan, Hey bin Yeqzan), ew mirovê li daristanê dijî, têkildariyên xwe bi lawir û dirindeyan re girêdide, her derdê wî dimîne ku mirovan bibîne û vegere civaka xwe, li dawiya van çîrokan jî ev dawî dibe.

Ji ber vê mirov weke zindîwerekî civakî tê binavkirin, her weke carina di danasînê de, em dibêjin ku mirov giyanewerekî aqilmend e, yan jî giyanewerekî bêjer e, bêguman em dikarin bibêjin ku ew giyanewerekî civakî ye jî.

-Tevî wilo, dema mirov digihin hev, nêzîkî hev dibin, bi hev re dijîn, diyardeyên neyînî di navbera wan de derdikevin, weke nelihevkirinê, xeydê, rikberiyê, nefêmkirina hev û jihevdûrketin di nerîn, raman û hestan de. Ev nakokî derdikevin, ji ber her kesek ji yên dora xwe cuda ye, wilo em dikarin bigihin encamekê ku ti malbat bê nakokî tine ye, çimkî ew kesên ku qedera wan bû ku malbatiyên hev bin, bêguman ne kopî ne ji hev ku rasterast hev fêm bikin û danûstandinên wan yên rojane bê pirsgirêk herin serî.

Lê pevçûn û nakokî jî tev ne weke hev in, hinek ji wan piçûk in, di bin kontrolê de ne, ew weke gelek tiştên rojane derbas dibin û carina nav li wan dibe (Xwêya jiyanê), lê hin caran pevçûn dibe pirsgirêkeke mezin ku çareserkirina wê aloz û zehmet bê. Pevçûnên zarokan, piraniya caran piçûk in, zû li ser tiştekî piçûk pev diçin, demeke dirêj derbas nabe ku her du zarok careke din vedigerin bi hev re dilîzin.

Sedemên ku dihêlin ev pevçûn gur bibin, zêde bibin û bi berdewamî di nav du zarokan de çêbibin gelek in, lê em dikarin li ser hinekan bisekinin, weke ku her du zarok temenên wan nêzîkî hev be, zarokên ku salek du sal di navbera wan de hebin bêhtir pev diçin û qayîşê bi hev re dikin, ji ber di gelek helwestan de, ew yê din rikberê xwe dibîne, her tiştê pêve girêdayî li ser hesabê xwe dibîne, yan jî ku ew çi serkeftinê bidest bixe di jiyana rojane de, ew dibîne ku ew kêm dibe, li vir divê dê û bav hay ji vî alî hebin, yekî di ser yekî re negirin, eger ne pêwîst be, ew zû xwe navêjin nav pevçûnên wan, tim yekî sûcdar nekin, her wiha wan beramberî hev nekin, ango nebêjin yekî li birayê xwe binêr û li xwe binêr, çima tu ne weke wî yî.

Tiştekî din ku dihêle zarok in ji yên din bêhtir pev biçin, mezinbûna wan, zarokên heşt salî bêhtir ji yê sê-çar salî pev diçin û dema bîrewer dibin û eger malbat karibe di avakirina têkildariyên durist de serkeftî be, ew pevçûn namînin, ji vê bêhtir, heskirinek taybet di navbera wan her du zarokan di mezinayiyê de çêbibe.

Herwiha dema valahiyê û jimara zarokan di malbatê de rola xwe dilîze, eger em bêjin ku malbatek heye du zarokên wê hene, temenên wan nêzîkî hev in, di vehesana havînê de ne, ti çalakî di jiyana wan de wan mijûl nakin, normal e ku li ser lîstokan, tilvizyonê û ……...

⑩

## Qamişlo ...
## Çarşem bi xwînê sor e.

**Mihemed Zekî Mihemed.**

Ezman li hev ketin
Zemîn hejiya
Taxên Qamişlo
Ji dengê teqînekê
Ji nişka ve
Hilçenîn
Bi vir ketin
Bi wir ketin
Gelo çi qewimî?!.
Nûçe mîna
Agirê ku di
Pûş biger e
Mizgefta Qasimo
Tundrew.....
Teqîn..... Kuştî.... Birîndar.
Taxa Xerbî wêran bû
Qêrîn.. Girî.
Çarşem bi xwînê
Sor bûye!!
Her kes bi Qasimo ve Bezî!!!
Gotin û ditin ne weke hev in.
Xanî kavil bûne
Bi xakê ve rast bûne.
Kî sax e?!.
Kî mirî ye?!.
Gelo kî dizane?!.
Hemî kelegirî dibin.. û dixebitin....
Ku rihan ji bin Kavilan riha bikin.
Bijîjk.. Dermansaz...
Zarokên bê guneh..
Bûk û zavayên bê mirad.....
Pîrejin .. Keçên ciwan.
Dibin kavilan de
Serqot man e.
Deng ji kesî nayê!....
Xwîsî ziwa
Di gewriyan de Maye...
Hêsir ziwa
Ji çavan dibarin.
Lê, kaniya hêviya
Li bajarê evîn û aştiyê
Namiçiq e.
Čaršeme QAMIŞLO
Bi xwînê sor bûye.

# BAGERA HESTAN

Îlham Osman



Berî ku tavên rojê rûyê erdê ramûsin.. tajanên zêrîn di gewdeya zemînê de cih bigirin.. Di hembêza berbangeke şînzayî de, lorîka diya pakrewanekî stûyê kêlika kevirî xar dikir.. Nalîna wê xemgînî di giyana min de diçêrand, û bi hêsirên bêwestan xerîbçîçek av dida.. Pelên daran tevlî simfoniya kovanan xwe li ba dikirin, û bêdengiya gora lehengan tîk dikir, û bi banga mizgeftan re nimêja sozdariyê deng vedida.

Min pişta xûz da kêlika pakrewaneke din, û bi dijwarî hîskehîska kelogiryê noq dikir. Çavên xwe li bedena ku xemgînî tê de gur dibû çêrand!!! XWEDÊWO!!! Ezê hêrsa dilê şewitî bi çi kedî bikim?!! Ezê roniya kîjan sozan, bi çavê reşgirtî de berdim?!! Çi gotin wê birîna giran bikewîne?!! Diya şêrê Kurdan, li bagera ku hestên min tê de windayî bûye, haydar bû... hêsiran berî lêvan got: Delala min!! Ne tenê li termê ku di axa sar de raketî didim hawar û qêrîn.. lêêêêê, li lehiyê xwînê, axîna birîndaran, û nelihevkirina biran jî canê min, şoreşa jana giran radike û aramiya şev û rojan diqelêşe..

## Kirina êzdîyên Sovêta berî, di tarîyê de ye ?!



**Tosinê Reşît- Ustraliya/Facebook**

Îro gelek kes dixwezin kirina êzdîyên Sovêta berî, di tarîyê de bihêlin. Xelata ji bo zimanê kurdî bi navê Qanatê Kurdo tune, xelata ji bo romanê bi navê Erebê Şemo tune, xelata ji bo berefkirin û parastina folklora kurdî bi navê Hecîyê Cindî tune, xelata ji bo helbestan bi navê Fêrîkê Ûsiv tune. Ma ew kesên xelat bi navên wan hene, ji van kesan bêtir xizmeta kurdnasîyê û çanda kurdî kirine? Ez wê bawerîyê me, wekî ev kesên min navên wan anîne, ne êzdî bûna, ji mêj va ne tenê xelat, lê kolan û zanîngeh jî wê bi navên wan hebûna .

# Xwendin kaniya zanînê ya yekem e

✍ Vejîna Kurd

Çiqasî mejiyê mirov têkildarî jiyana pêşketinan bibe, ewqasî ew fireh û dewlemend dibe û nexşeya bikaranîna mejî rengîn dibe. Û daku asoyên têgihîştinê fireh bibin, xwendin pêdiviyeke giring e. mirovê ku li xwendinê miqate be, dikare bi hêsanî raman û nerînên durust di hemû mijar û sirên jiyanê de pêşkêş bike û bersiva demê jî bide, dikare têkiliyan bi endamên civaka xwe û yên biyanî re li ser bingeheke durust û xurt dîne, pirsgirêkan çareser bike, bazaran bike, û axaftinên xwe bi zanîn û zanistê bixemilîne, ango ew girtî namîne û ji aloziyên jiyana teng rizgar dibe, çanda miletê xwe û ya hemû miletan û şaristaniya gelan nas dike û sûdê jê werdigire, û herweha dîwarên nezaniyê di jiyana xwe de hildiweşîne. Ji bilî wê jî em dikarin bêjin ku dema mirov bi xwendinê mijûl dibe, dilê wî vedihese û giranbûna demê hinekî sivik dibe.

Lê pir cihê mixabiniyê ye ku, di vê serdemê, hejmareke mezin ji keç û xortên me dev ji xwendinê berdane, pir tiştên normal nebihîstine û şaşîtiyan di bilêvkirina bêjeyan û nivîsandinê de dikin, agahiyan di derbara mijarekê yan pirtûkekê yan….hwd nizanin, ango ew ji çand û reşenbîriyê dûr in. Ma gelo çima ev nifşê nû giringiyê nade xwendinê û roj bi roj rêjeya xwendevanên pirkûkan di civakê de kêmtir dibe?!!

Hin zanyar dibêjin ku pirsgirêkên jiyanê û mijûlbûna xelkê bi jiyana aborî sedema sereke ye, hin jî dibêjin ku sedem alavên ragihandinê yên nûjen radyo, televizyon û internêt e, ji ber ku ew alav nûçe û agahiyan li ber destên mirov, bê westandin, datînin, û herweha rola pirtûkan kêmtir dibe. Hin jî dibînin ku ew kêmasiya malbat û dibistanê, di çandina tovên hezkirina xwendinê û pirtûkan di dilê mirov de, ji dema zaroktiyê ve ye, zarok mezin dibe bê ku giringiya xwendinê zanibe.. Sed mixabin, pir kes hene, piştî ku ji zanîngehan der diçin, pirtûkan davêjin û her tiştekî pê ve girêdayî ji bîr dikin, tu dibêjî qey xewndin barekî mezin bû li ser milên wan û niha ew jê xelas bûn!! Ev rûdawa jî pirsgirêkeke çandî mezin derdixe holê. Em ji bîr nekin ku buhabûna nirxê pirtûkan û rewşa aborî ya xirab a milet jî sedemeke berçav e.

Pirtûk kaniya zanînê ya yekem e, û divê her mirovek ji ava wê ya zelal vexe, ma gelo emê çawa vê çandê di hişê vî nifşî de biçînin?!.

---

# Ji bo civakek bi hêz

✍ Nazdar Hesen

Rastiyeke bingehîne, ew jî ew e, ku hêza her civakekê û serkeftinên wê ne bi heyîn û samanên wê yên madî ne, û ne jî bi giranbûna çekên wê yên curbecur tê pîvan, lê ew bi hêminiya wê ya derûnî û sîstema têkilî û pêwendiyên pêkhateyên wê yên navxweyî ve tê girêdan .

Çiqas civakek heyînên wê pir û dewlemend bin, lê eger têkilî û pêwendiyên pêkhateyên wê nelihev û ne baş bin, ango rêzgirtin, hezkirin û têghîştin di nava wan de tune be, yan zimanê pê diaxive zimanê çekan be, ne zimanê hişmendiyê û diyalogê be, bê guman, bingeha wê civakê wê ne kûr û tekûz be, ewê bi hêsanî jî were jihevkirin û rûxandin .

Erê hêza her civakekê bi çawaniya danûstandina pêkhateyên wê civakê tê pîvan, çiqas ew civaka giha be asteke bilind ji zanîn û hişmendiyê, ewqas ewê bi hêz be û ji destêwerdan û xefkên neyaran jî parastî be. Wisa jî nirxê mirovatiyê bilind dibe, û yekbûn, yeksan û yekêş jî di nav pêkhateyên wê de cî dig re.



## Rewşa Çandiniyê … Dûmahîk

pêdewîstên [مستلزمات] çandiniyê, bazara firotana berheman û mirov cotkarên bi qîret. Ew her pênc kirde jî, berî sala 2011ê, ta radeke pêgerek li Efrînê peyda dibûn, nemmaze jî piştî ku bendava Meydankê kete kar û seranserî Deşta Cûmî avî kir.



Di wan salan de, ango berî qeyrana Sûryê dest pê bike, pêdvî û pêdewîstên çandiniyê bi hêsanî û bi buhayên guncav [مناسب] dihatin peydakirin. Pêdviyên mîna tibabek ji peran, tov, semad û jî derman, bi buhayên erzan ji aliyê dewletê de dihatin peydakirin. Ji hêla bazarê ve jî, berhemên sereke mîna genim, pembû, çelem, titûn, kartol.. û H.W.D, ji hêla dewletê de dihatin kirîn. Ji bilî ku bazara bajarê Helebê ya mezin û fere, û hemî bajarên Sûryê yên din jî, ji bo berhemên din, mîna zêt, nok, nîsk, meywe, keskahî û gelek berhemên din jî, vekirî bû, û da radeke bilind pirsgirêka firotina berheman çareser dikir, û hevpîvanek digir nirx û buhaya berheman, û belkî catkar pê pir bi pêş ne diket, lê bi zirar jî dernediket.

Lê piştî ku qeyranê li Sûryê dest pê kir, dezgehên dewleta navendî ji Efrînê vekşîn, ew hemî derfet û tiştên ku ji çandiniyê re gerek û sûdar bûn, ji dest çûn, û li zemînê destlatdarî kete destê Rêvebiriya Xweser, yanê ew bû berpirsiyar ji ber rewşa çandiniyê û cotkaran û piraniya karûbarên di jî. Ji ber di encama wê guhertinê de, piraniya karên ku dewletê ji çandiniyê û cotariyan re dikir, rawestîn, û bi yekê rewşa çandinê jî derbas qonaqeke cuda û têvel bû.

Di vê rewşa nû de, û ji bo parastina çandiniyê, û parastina rewşa xelkê me yê cotkar jî, tiştine giring ketin stuyê rêvebiriya navçê, û roja îro ew di ber de bûye berpirsiyar, û pêdiviyên cotkaran û çandiniyê jî ji wê tên xwestin, û ji erk û stubariya wê ye ku pêdviyên mîna tov, derman û semadê bi wan bi buhayên guncav peyda bike û bigihîne cotkaran, bi taybetî jî semad.

Wek tê dîtin, roja îro rûberine fere ji deşta Cûmê bê avdan mane, tê xwestin ku pirsa elêktirîkê were çareserkirin û av ji berbeqên mezin were hildan û bigihîne zevîyên cotkaran. Bêguman, ew karina wê ne belaş bin, xweserî kane mesrefa xwe ji cotariyan wergire, û dema ku cotkar bibîne av digihê zeviyê wî, ewê bê erêna buhaya wê bide û erkên xwe bike.

Kirdeyekî din ye giring heye, hejmareke mezin ji endezyarên çandiniyê û alîkarên wan li navçê hene, û rêvebiriyê ew destesar kirine, û bêkar rûniştine, û piraniya wan jî amade ne ku bi dilsozî xizmet navça xwe bikin. Pir giring e, ku xweserî wan bi şêweyên erênî xwe bide kêleka wan û sûdê ji zanîn û şarezahiya wan werbigire. Çinkî çandinî jî zanîn e û bi saya wê bi pêş dikeve.

Ji bilî wan tiştan, gerek e bazar ji berhemên çandiniyê re werin peydakirin, erê rewşên navçeyên derdora me û tevahiya Sûryê li ber çavan e, lê netê wê wateyê ku cokar berheman bigihîne ber gewriyê, û paşê bi ser wî de bimînin, netên firotan û ziyanê jê bibîne.

Ta roja îro, û ta radeke bilind, aboriya rêvebirya navçê li ser milê cotariyan radibe. Loma jî, zor pêwîst e ku rêvebirî guhdaneke mezin bide çandiniyê, û pêdewîstên geşpêdana wê peyda bike. Yan jî rewş wê sal li dû salê xirabtir bibe, xelk wê dilsar bibe û zevî jî wê bûr û wêrankirî bimînin!!.

# Perwerde û Fêrkirin li Efrînê

**Efrîn, Perwerde û Fêrkirin-net**

Sala 2016-2017an li dibistanên herêma Efrînê dest pê kir. Li gora serhejmarên fermî ku ji desteya perwerdê derketin, 49hezar şagirt li dibistanan hatine tomarkirin; jê 40 hezar ên asta seretayî ne, di 270 dibistanê de dixwînin, û 9 hezar jî yên amadeyî û navendî ne, ew jî di 50 dibistanê de dixwînin. Hejmara mamostan jî wiha ye: 1800 ji bo asta seretayî û 650 jî ji bo astên amadeyî û navendî.

Ji bilî wan, dora 250… şagirt li peymangehan jî xwendina xwe dikin, ew peymangeh jî ev in: Bijîşkî, endezyarî, çandinî, kompyûter, kargêrî, werzişî, hunerên şano, amadekirina mostan.

Di zanîngeha Efrînê de jî şeş fekulte hatin vekirin, tê de 340 şagirt di salên yekê û diduyan de hatin tomarkirin, fekulte jî ev in: Fekulta wêje (beşê zimanê kurdî û beşê rojnamevaniyê), endezyariya kehromîkanîk, çandinî, û zanistên aborî, bijîşkî.

Hêjayê gotinê ye ku, rêbazên astên seretayî, amadeyî û navendî hemû bi zimanê kurdî ne.

---

**Pevçûnên Zarokan … Dûmahîk**

xwarinan pev biçin.

Ji aliyekî din ve, xuya ye ku zarokên ji yek zayendê, her du keç bin, an kur bin, bêhtir ji yên din pev diçin, ji ber lîstik û mijûliyên wan jî yek in û ji ber bêhtir xwe weke hev yan jî li dijî hev dibînin.

Lê em ji bîr nekin ku sûdeyên pevçûnên zarokan li zarokan bi xwe hene, weke naskirina têgeh û prinsîpên hevjiyanê ku zarok nas dike ku her tişt ne ji bo wî ye û weke ew dixwaze tim dibe yan tim weke dîtina wî rast e, herwiha zarok bi rêya van pevçûnan karînên xwe nas dike ku ew dikare berevaniya xwe bike, li ber xwe bide, mafê xwe bixwaze û zor û sitemê qebûl neke.

Hestên lêborînê, serkeftinê û carina pejirandina têkçûnê jî, zarok bi rêya van pevçûnên piçûk nas dike, ji ber jiyana zarokê di malbatê de, dibistanek e, bi hemû xweşî û nexweşiyên xwe, wî fêrî jiyana derve ya civakê dike, çi tiştê pê re derbas dibe, jê re di jiyana sibe de dibe ezmûn û bîrewerî.

Carine din ew rika di navber didiwan di malbatê de, eger tevlî henekan bibe, jiyana malbatê geş dike û seqayeke xweş di hundirê malê de çê dike.

Derbarê van pevçûnên bêguneh, ne tim divê dê û bav xwe bavêjin nav wan, ji ber ya rast ku ew fêr bibin çawa pirsgirêkên xwe çareser bikin, tenê divê dê û bav di rewşine taybet de bikevin navbera wan, ew jî dema lêdana tund, bikaranîna alavên tûj û metirsîdar, gotina sixêfan, pevçûn bibe sedema dûrketinê ji erkên xwendinê, yek ji wan nexasim yê piçûk tim hestên bindestiyê li ba wî hebin û hewldanên tolhildanê li ba wî peyda bibin.

---

**Pirs û … Dûmahîk**

hev û tevgdigerin. Ma gelo rayedar û sîyasetmedarên partiyên kurdî, çima nikarin van pilanên wan rast bixwînin, û lêvegerekê ji siyasetên xwe yên nelihevkirinê re bikin û jê vegerin?! Eger rewşa partyên kurdî weha bimîne, ma gelo asta rêjeya kîjanê bilind dibe, serkeftin an derdan?!

Ji berê û paşê de Kurd li eniyên şer bi serkeftinê têne naskirin. Belê dîrok weha dibêje, û îro jî wilo ye, lê li ser masyeyên danûstandinê û îmzekirina hevpeyman û lihevkirinên herêmî û navdewletî, serkeftinên wan têne derdan û doza wan mîna berê dimîne. Di vir de jî pirseke mezin tê kirin, ma gelo diplomasiya Kurdên Rojavayê Kurdistanê li gor qunaxa ku îro doza Kurdî tê de ye, yan mîna hercarên ku Kurd di bazaran de hatine kirîn û firotan?!

Ji ber wê jî banga gel dibêje: Eger tevgera kurdî ya siyasî, bi hemû partiyên xwe dixweze dîsa dîrok serkeftina doza kurdî li Rojavayê Kurditanê nebe qurbana pilan û pîlanên dewlet û sîyaseta xêrnexwezên gelê Kurd û Kurdistanê, û xwîna pîroz a pakrewanên me li boşê neçe, divê her yek ji van partiyan li xwe vegere û bi şêwakî ji şêweyan yekrêziya xwe ava bikin.

**Ji dîroka … Dûmahîk**

têgeha mêldariya medî li ba Medan ber bi pêşve biribû, ew ji têgeha (êla dewlet) û ya (gundê dewlet) ber bi têgeha (Dewleta milet) de hildabûn. Xuyaye, ku têkçûna şoreşa Deyako, û dîlkirina wî, rê li pêş dubarekirina nakokiyên Medan vekir, lê bê guman, rola polîtîka şahnişîna Aşûr jî di kûrkirina jihevxistina Medan de hebû. Xeşterît cefayên xwe ji bo du waran terxandibû:

Yekem, warê hindurîn: Xeşterît careke din êlên Medan hanîn ser hev, û mêldariya bi ser milet ve, da pêş mêldariya bi ser êlê de, û sazûmanên dewletê hêzdar kirin. Hêjayî gotinê ye, ku şahnişîna Med di dema Deyako de penaheke(kîyan) hevgirtî bû (li gor têrma nû federal bû), û rêvebirên wan êlan, di encûmena hevgirtinê de şah hildibijartin, û biryarên çarenûs digirtin. Xeşterît artêşa dewletê ji nû ve organîze kir, û li gorî bingehine nû perwerde kir, û tektîkên cengê û tîrkevanî û perwerdeya siwaran û hunerên şerkariyê ber bi pêş ve birin.

Duwem, warê herêmî: Xeşterît êlên sînordar ber bi xwe ve anîn, wek êlên Sîmmîriyon/ Cimmerians û Sîkîs/ Scythians, ku giringtirînên wan êlan bûn, û êlên Farisan ji heyştemîn sedsala b.z de li Başûr Rojhilata Med bi cih bûbûn. Xeşterît da ser wan êlên Farisan, û ji bo parastina pişta Med, gava bide ser şahnişîna Aşûr, tev li şahişîna Med kirin. Hêrodot dibêje: "Feraort (Xeşterît) bû şahê du gelan, her du jî hêzdar bûn, piştî ku ev serkeftin bi dest xist, berê xwe da Asiyayê, ku dest bide ser, di her cengekê de bi ser diket, û welat li pêş hêza wî yeko yeko diketin, û cenga dawî ew bû, ku da ser Aşûriyan".

Ragihandina şoreşê: Di meha Newroza sala (673 b.z) de, Medan bi serperştiya Xeşterît dan ser şahnişîna Aşûr, heye ev yeka bi boneya cejna Mewrozê ya, ku di kelepûra Kurd de kevin e, bû. Ewana ji nişkave, bi nûtektîkên şerkariyê û bi nûhunerên cengê, dan ser artêşa Aşûr, û şoreşgerên Medan, bi awayên nû û aferînî, dan ser kelehên wan. Deyakonov dibêje: "Dorpêçkirina kelehên Aşûr ji hêla Medan de bal dikşand, ji ber ku ne wek dorpêçkirinên cengan bû, belê serhildan û şoreş bû, ku li ser bingeha stiretacîk û hunerên cenganî bû. Bi vî awayî Aşûrî ji kelehên xwe baz dan, tevî ku artêşa wan, wê demê, wêrek û hêzdar bû, û wê baştirîn çek hebûn". Şoreş bi ser ket, û hemî deverên Med ên gelek fireh hatin rizgarkirin, û şah Xeşterît, ji bo gêrkirina împeretoriya Aşûr û rakirina sitema wê ji ser gelên Rojavayê Asiyayê, bi xwe ket pêş artêşa xwe û da ser Nînewa; paytexta împeretoriya Aşûr. Hêjayî gotinê ye, ku beriya wî, hêç şahekî din newêrîbû bide ser şahinşîna Aşûr, ji ber ku desthilata wê gelek sitemkar bû, û saw xistibû dilên gelên sînordar.

Têkçûna şoreşê: Hikumdarên Aşûr dizanîbûn, ku çêtirîn alav ji bo têkbirina hêrişa Medan bi ser paytexta wan de, ew e ku hevbendiyên wan li gel gelên sînordar hilweşînin, û artêşa Medan bi dijminên hêzdar û sitemkar re, ango bi Sikêsiyan re mijûl bikin. Aşûrî di vê pilanê de bi ser ketin, û rêvebirên Sikêsiyan li dij Medan sor kirin, û şahê Aşûr, Aşûrpanîpal keça xwe li şahê wan Madiya / Madyes mehir kir, da hevbendiya Aşûr-Sikês hêzdar bike. Aşûrpanîpal berê Sikês bi serperştiya şahê wan Madyes ber bi hêrişa ser Medan ji paş ve da, pêre jî hêzên Medan ketin navbera du artêşên şerkar û di cengan de xwedî taqet, Xeşterît şikest û ceng ji dest da, û sala (653 b.z) di wê cengê de hate kuştin, piştî ku 22 salan hikumdarê Med bû. Encama vê cengê ew bû, ku Sikêsiyan welatê Med 28 salan dagîr kirin (653-625b.z). Bê guman ev yeka bi erêkirina hikumdarên Aşûr bû, ewana Sikêsî, ji bo alîkariya, ku împeretoriya Aşûr li ser lingan hêşt, bi şahnişîna Medan perû (xelat) kirin . Bi vî awayî Med bendewarên pêşewayekî din man, da pirojeya rizgarkirinê bi rê ve bibe. Ew pêşewa jî Keyxusrew kurê Xeşterît bû.

**Alîtî … Dûmahîk**

di ser re neborin; lê eger tevgera Kurd li ser xêza berjewendiyên partîtiyê dom bike, û dev ji alîtiyê (Mehawir) bernede, bi rastî ev derfet û hêviyên ku peyda dibin wê winda bibin, û qunax weke carên borî dîsa di ser Kurdan re derbas bibe, û ev jî xwekujiya rasteqîne ji gelê Kurd re e.

Lewra jî mirov kare bêje, girêdana tevgera siyasî ya Kurd li Sûriyê bi hêzin kurdistanî ve, û destêwerdana wan ya bêsînor di nav tevgera Kurd de, bobelatek mezin e ji Kurdên Sûriyê re, û her wiha rik û nakokiyên kûr di nav tevgera siyasî ya Kurd de li Sûriyê çêkiriye, ji ber vê yekê, dibe partî û çarçewên kurdî yên ku xwe bi hêzin dervayî Kurdistana Sûriyê ve girêdane û bûne alî (Mehawir), şiyar bin û dev ji alîtiyê berdin da ku karibin li gor berjewendiyên Kurdên Sûriyê têkoşîn û xebatê bikin, û derfetên ku peyda bibin ji dest xwe bernedin, ta ku mafên gelê Kurd ên rewa di Sûriyeke demokrat, piralî, perlemanî, fedral de bisepînin .

# Roja Helbesta Kurdî



Helbestvanê gewre seydayê Cegerxwîn li roja 22/10/1984an temenê xwe kir û çû ser qedera xwe. Li sala 1993an, û ji bona bîranîna roja goçkirina wî, mehrecana yekem a helbesta kurdî li Sûryê, li ser şanoya şûnewarî li warê Kela Nebî Hûrî-Efrîn hate lidarxistin. Wekî her sal, îsal jî helbestvan û helbestnivîsên ku bi zimanê kurdî dinivîsin, li gelek navçe û deverên kurdî li Sûryê û li welatên Ewrupa jî mehrecana helbesta kurdî li dar xistin û ew boneya giring bi bîr anîn. Spas ji herkesê ku ji bo lidarxistina wan mehrecanan westiya ye, lê amade bûye û bi helbestên xwe tê de beşdar bûye û hîştin ew bi serkevin.

---

# Têbînine Rêzmanî

✍ **Rozad Elî**

Di bin navnîşana ((hin şaşiyên giştî li cem hin nivîskara)), Rêzdar Dilovanê Deştê nivîsarek di rojnmama Newrozê, hejmara 122an de weşand. Em jî dixwazin çend têbînan li ser wê nivîsarê bêjin.

a. Di deqê de biwêjên mîna: *Hevgirtî bê.. ev didê xuyakirin…* li vir nivîskar nîşandeka kesê sêyem (e) bi (ê) diguhêre; ev jî tiştekî herêmkî ye, û li derveyî rêzkên rêmzmana kurdî ye. Ya rast gerek ew wiha bin: *Hevgirtî be.. ev dide xuyakirin…*

b. Nivîskar wiha nivîsiye: *((Piraniya nivîskaran.. bi awayekî şaş nîşana gelejimariyê bi dawiya dîrokê ve dikin. Nimûne: Di roja 5an de ..., di sala 1988an de… Ezê sedemên şaşîtiyê bênim ziman: Nîşana/ veqetandeka yekejimariyê bi dawiya bêjeyên (roj, sal, meh, …) ve dikin, û ev didê xuyakirin ku em li ser yek roj, yek sal... daxivin. Ma çawa emê (-an)ê bi dawiya hejmara demê ve bikin? Di vê derbarê de, ya rast em bêjin: (di roja 5ê de ..., di sala 1988ê de...). Ka em van herdu hevokan beramberî hev bikin:*

*- Di 1988an de bi hezaran pakrewan bûn qurbanî.*

*- Di 1988ê de bi hezaran pakrewan bûn qurbanî.*

*Hevoka pêşî didê xuyakirin ku van qurbaniyan seranserî 1988 salan jiyana xwe ji dest dane; û ev şaşîtiyeke rêzimanê û dîrokî ye jî. Di hevoka dî de, diyar e ku ev qurbanî di yek salê de çûne)).*

Wekî ku em dizanin, carina jmarnav kardayîna rengdêra jimarîn û mêjer werdigirin û rêz û mêjera navdêrê dide nasîn:

1-Mêjer: Jimar li pêşiya navdêrê tê: *Wê serdemê 1988 salan dirêj kir.* Li vir hejmara salan diyar dibe, û (sal) tewanga gelejmariyê a jmarnavê (hejmar-1988) jê distîne, û dide nasîn ku sal gelek in, ne yek e.




2-Rêzîn: Li paş navdêrê tê û rêza wê dide nasîn: *Li sala 1988an dest pê kir.* Li vir jmarnav tê tewandin û (sal) jî bi veqetandeka yekejmara mêza (a) pê ve tê girêdan, ji ber ku sal yek e û ne gelek in.

Lêbelê eger jmarnav wek navderekê di hevokê de hati be û bireserke wê hebe, ew li gora chê xwe di hevokê de veqetandekan dibe: *Li roja bist û pênca miha Cotmehê...* li vir du navdêr (roj, mihe) û jimarnavekê (pênc) dan pey hev û bi bireserkê (Cotmeh) ve hatine girêdan, loma jî her sê nav veqetandekê dibin û bi navdêr tewandî (Cotmeh) ve têne girêdan.

Di baweriya me de, gava rêzdar Dilovan nêrîna xwe dibêje, ew ketiye bin bandora axaftina devkî û deverkî. *(ji bo vê mijarê pêwîst e, ku em li rêzmana Celadet Bedirxan vegerin).*

**Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re, yên di girtîgehên Sûriyê de**

**Êmêla Newrozê:**
**Newroz@yek-dem.com**